


# Slav û tu bi xêr hatî Swêdê!

Em dixwazin alîkariya kesên ku nû hatine Swêdê bikin da ku ew bi awayekî asayî xizmeta tenduristiyê nas bikin. Ji ber vê yekê em miayeneyeke bêpere pêşkeşî te dikin. Di hevdîtina miayeneyê de em ê li ser tenduristiya te biaxifin û em ê hin testan werbigirin. Tu yê herwiha agahiyê bistînî ka tu çawa dikarî ji xizmeta tenduristiyê îstifade bikî. Di hevdîtinê de tercimanê zimanê te yê hazir be.

## Formê li xwarê bi lez dagire da ku em karibin têkiliyê bi te re deynin.

Kesên ku di xizmeta tenduristiyê de kar dikin xwediyê erka sirveşartinê ne û ji ber vê jî ji daîreyên din tu kes bêyî izna te nikare bigihîje agahiyên miayeneya te. Eger tu vêga nexweş bî an jî eger tu berî dema miayeneyê nexweş bikevî divê tu têkiliyê bi merkeza tenduristiyê ya nêzîkî xwe re deynî. **Ev miayeneya ku em pêşkeşî te dikin bêpere ye û em ê herwiha heqê rêya te ya ji bo ku tu werî vir jî bidin.**

Eger tu karibî bi swêdî an jî bi ingilîzî biaxivî, tu dikarî telefonî me bikî û ji bo miayeneyê wext veqetînî. Hejmara me ya telefonê 0270-771 76 e û dema telefonkirinê duşem-în, saet 9-15 e. Tu dikarî herwiha bi rêya vê adresa e-mailê wext ji bo miayeneyê veqetînî: asylmigranthalsa@regiongavleborg.se. Ji ber sedemên ewlehiyê tu nikarî bi vê e-mailê li ser rewşa xwe ya tenduristiyê pirsan bikî, lê tu dikarî agahiya giştî werbigirî û tu dikarî wext ji bo miayeneyê veqetînî.

**Fermo û bi dilxweşî têkiliyê bi me re deyne!**

Daîreya tenduristiyê ya penaber
û koçberan a li Gävleborgê,
Nexweşxaneya Nêzîk a Söderhamnê
826 81 Söderhamn

☑ Erê, hûn dikarin ji bo veqetandina wextê miayeneyê têkiliyê bi min re deynin.

**Nav:** ............................................................

**Adres:** ............................................................

**Telefon:** ............................................................

**Hejmara Kesane/Personnummer:** ........................................

**Ziman:** ................................ **Memleket:** ................................

Kurmanji

Region
Gävleborg

Frankeras ej
Mottagaren
betalar portot

**Region Gävleborg**
**Närsjukhuset Söderhamn**
**Asyl- och migranthälsa i Gävleborg -439-**

**SVARSPOST**
**20513177**
**808 00 Gävle**

TEJPA IHOP